

ÇİROKËN DAPÏRA MÏN



ÇİROKÊN DAPÎRA MIN

PÊŞGOTIN

Çîrokên kirmanckî yên ku pîr û kalên me zivistanê li dora sobeyan, havînê li nav zeviyan, li baxçeyan, êvarê li dîwanên ku dihatin saz kirin ji me re digotin, weke kirmanckîya ku zaravayê kurdî yê di listeya UNESCO'yê ya zimanê di bin xetereya windabûnê de ye, tî jibîr kirin û wînda dibin. Ji bo mayîndekirina van berhemên girîng ên jikevneşopiya devkî, deh çîrokên kirmanckî yên ku hîn tî zanîn me bi zaravayê kurdî yê kirmanckî berhev kir, dûre bi wergerandina zaravayê kurdî yê kurmanckî me xwest bi we zarokên hêja re parve bikin.

Em spasîyê xwe ji kes û Bernameya Piştgiriya Alîkariya Maf û Rêxistinên Mafê Mirovî “Mafê Çandî û Zimanî” dikin ku ji bo alîkarî dan berhev kirin û berbelavkirina van berhemên bi awayekê gelerî heya roje me hatine.

Weqfa Koçberiyê û Alîkariya Mirovî



CINAWIRÊ BÊBEXT

Hebû tune bû, mehînek û cinawirek hebû.

Bihar bû her der gul û gulistan bû, xwediye mehîne ew bera derve dabû. Mehîn ji xwe re li nava mêrgê diçêriya. Cinawir jî birçî mabû, ji xwe re li seydê digeriya, dema tê ser kêş û çav li mehîne dikeve. Dibêje:

– Wele divê ez hincetekê bibînim û vê mehîne bixwim.

Cinawir xwe bera xwarê dide tê hinda mehîne û jê re dibêje:

– Çima tu di mêrga min de diçêrî?

Mehîn lê vedigerîne:

– Mêrga te ji ku hatiye? Ma ne mêrg, ên mehînan in?
Mêrgên cinawiran tune ne!



Cinawir li ser van peyvan dibêje:

- Na xwişkê, ev mêrg a min e û tu hatiyê tê de diçêrî!

Li ser vê yekê mehîn jê dipirse:

- Îcar daxwaza te çi ye, tu çi ji min dixwazî?

Cinawir bersivê didê, dibêje:

- Ji ber ku tu di mêrga min de çêriyayî divê ez te bixwim!

Mehîn lavayiyên dike, li ber cinawir digere, dibêje:

- Eman hewar birako, min nexwe! Ez ketime bextê te!

Lê cinawir qet guh nade van peyvan û dibêje:

- Îmkana wê tune ye, ez ê îro te bixwim!

Mehîn lê dinêre wê bi rastî jî cinawir wê bixwe, jê re dibêje:

- Wisa xuya ye tu yê min bixwî. Lê beî ku tu min bixwî were xêrekê bi min bike. Min ji êşa lingê min xelas bike, da ez bi vê êşê neçim wî aliyê. Dema xwediyê min lingên min nal kiribûn, mîxek di lingê min ê dawîn re çûbû. Ew mîx ji hingê ve kezeba min dişewitîne. Were ez lingê xwe bilind bikim û tu jî bi xêra xwe wî mîxê malmîrat bikişîne, derxîne û bi dû re tu min dixwî bixwe.

Li ser van gotinên mehînê, gunehê cinawir pê tê û daxwaza wê qebûl dike.

Cinawir ji paş ve nêzîkî mehînê dibe da ku wî mîxê di lingê wê de derxîne.

Mehîn jî jixwe li benda vê ye. Heta ku cinawir xwe dirêjî lingê mehînê dike, heta jê heye mehîn zîfikekê li nava çavên cinawir dixê. Bi wê derbê re hiş ji serê cinawir diçe, li erdê dirêj dibe û mehîn baz dide ji wir bi dûr dikeve.

Pişfî seetekê duduyan, cinawir bi ser hişê xwe de tê û radibe ser xwe.



Hêdî hêdî bi aliyê ku jê hatibû de dimeşe. Dema bi kêş ve hildikişe, mêrikek li ser kêş ji xwe re êzingan dibire.

Dema mêrik çav li cinawir dikeve, dibêje:

– Ev mîratê bi aliyê min de tê, gelo wê min bixwe çi bike.

Û xwe di pişt darê de vedişêre.

Cinawir jî tê ber wê darê, berê xwe dide aliyê mêrgê û xwe bi xwe dibêje:

– Kes tune ye bi dêla min bigire û du zopeyên baş li bin zikê min bixe! Paşê jî ji min re bibêje:

“Kuro kero! Te mehînek dîtiye bixwe! Ma bavê te nalbend e ku tu diçî nalbendiyê dikî!”

Piştî ku mêrik van gotinan dibihîze, ji pişt darê dertê, bi dêla cinawir digire û bi destiyê bivirê xwe; li vê kêlekê û li wê kêlekê dide. Cinawir ji ber wan derban divirvire ji kêş gêr dibe tê heta xwarê.

Her du destên wî bi her du kêlekên wî ve radibe ser xwe û dibêje:

– Wey bavo! Wey bavo! Meriv newêre ji xwe re li çolê jî henekekê bike û gotinekê bibêje!

Hema bi rastî ew tişt tê serê meriv!

Û direve diçe...

Çavkanî: Hacî Ungur

Gund: Hacîson / Pîran / Amed

Berhevkar: Derman Ungur



A stylized teal cloud with white stars and swirls, containing the text.

**DU ROUYËN
FENEK**



DU ROVIYÊN FENEK

Hebû tune bû, du roviyên fenek hebûn.

Rojekê her du tîn ba hev, yek ji ya din re dibêje:

– Xweha min, tu nizanî bê çi qas fenên min hene!

Roviya din jî meraq dike, dibêje:

– De ka fenên te çi ne? Bibêje em jî zanibin!

Roviya xwedîfen destê xwe bi wî aliyê de dike û lê vedigerîne:

– Li wê derê bîrek heye. Min dît zilamekî laşek bir xist wê bîrê.



Her du rovî radibin diçin ser wê bîrê. Xwe bera binê wê didin
û dikevin ser wî laşî dixwin.

Lê roviya din ji ya bifen re dibêje:

– Niha ew zilam di me re derkeve em ê xwe di ku de kin?
De bibêje ji min re. Ka te digot fenê min hene. Hela ji wan
fenên xwe hema yekî bibêje.

Roviya bifen di halê xwe de difikire difikire, dibêje:

– Wele fenekî min hebû lê nayê bîra min.

Çima tu nabêjî di wê gavê de zilam nayê? Roviya dinê
dinêre di roviya bifen de xêr tune ye, dibêje:

– Heyra fenekî min heye ez ê ji te re bibêjim.

Roviya bifen guhê xwe didê, dibêje:

– Ka bibêje fenê te çî ye?

Ew jî dibêje:

– Dema zilam hat, em ê xwe li erdê dirêj bikin wekî ku em
miribin. Paşê, wê rahêle cendekê me û wê me biavêje derve.
Hema her du jî xwe li erdê dirêj dikin wekî ku miribin xwe hişk û
biringî dikin.

Zilam çawa çav li wan dikeve, dibêje qey her du rovî bi zêdexwarina goşt mirine.



Radihêle wan û diavêje derveyî bîrê.

Dibêje:

- Min digot qey ez ê we bi saxî bigirim; lê xem nake, ez ê we bigurêm û çermê we bifiroşim.

Piştî zilam wan diavêje derve, her du roviyên fenek hema çawa radibin ser xwe dibêjin “şirp” û direvin, xwe xelas dikin.

Dema zilamê me ji bîrê derdikeve ku çi bibîne?

Her du rovî li holê tune ne...


Dirok: Pûşper 2013

Herêm: Zereyê Gêlî / Amed

Çîrokbêj: Şerîfa Aktay

Ji dayîkbûna Çîrokbêjê: 1960

Berhevkar: Zerrîweş Esnaw






QIJIK Û
ÇÊLJKÊN WÊ

QIJIK Û ÇÊLIKÊN WÊ

Hebû tune bû, qijkek û çêlikên wê hebûn.

Qijik, heta çêlikên wê hînî firê dibin wan xwedî dike. Rojekê
êdî çêlik tên ber firîne û divê diya wan, destûrê bide ku ji
hêlîne bifirin herin.



Qijik, berî ku destûra çêlikên xwe bide; dixwaze şîretinan li wan bike da ku ji bo vê jiyana xwe ya nû amade bin.

Wan li dora xwe dicivîne û dibêje:

- Çêlikên min ên delal! Ez ê şîretê li we bikim. Heke hûn soza bicîanîna şîreta min bidin; ez ê we bi firê bixim.

Qijik, ji bo ku çêlik qenc guhdariya wê bikin, xwe nêzîktirî wan dike û dûre peyva xwe didomîne, dibêje:

- Dema hûn li erdê an jî li ser darekê veniştî bin û merivek bi aliyê we de were;

heke çawa xwarî erdê bû, hema qet nesekinin birevin.

Ji lew re hûn zanibin ku mebesta wî merivî ew e ku ji erdê kevirekî hilde û bi wî kevirî li we bixe.



Li ser vê şîretê, çêlikeke ji wan li diya xwe vedigerîne û
dibêje:

– Dayê! Lê ew merivê ku te qala wî kir, xwarî erdê nebe û
heke kevirê wî di paşila wî de veşartî be em ê çi bikin?

Li ser vê pirsê çêlikê, dilê qijkê dikeve cî.

Çêlikên xwe bi firê dixê û li pê wan van gotinan dibêje:

– Herin çêlikên min!

We şîretên xwe girtine, ji niha pê ve pêdiviya we bi tu
şîretên din tune ye.

Çavkanî: Mahmud MAYA

Cî: Hêne



A teal-colored decorative shape with a scalloped, cloud-like border. It contains several small white stars and is surrounded by larger yellow four-pointed stars.

LAWIRÊN
BEREDAYÎ




LAWIRÊN BEREDAYÎ

Hebû tune bû, rojekê xwediye malê ji dîkê xwe hêrs dibe,
dibêje:

- Ev dîkê han nema serê sibehê bang dide,
ji ber wê ez di xew de dimînim û
nikarim karên xwe yên serê sibehê bikim.

Radibe bera dîkê xwe dide û wî derdixe derve.

Dîkê reben dide rê, ji wan deran diçe.



Di rê de rastî kerekî tê, ker jê dipirse:

- Birayê dîk! Te xêr e? Tu bi ku derê de diherî?

Dîk lê vedigerîne, dibêje:

- Xwediyê min, bi hinceta ku ez wekî berê sibehan zû bang nadim, ez ji mala xwe qewirandim.

Piştî ker bersiva wî dibihîze, dibêje:

- Birayê dîk! Ma çima tu nabêjî çarenûsa min û te yek e? Xwediyê min jî ez ji mala xwe qewirandim. Wî jî bi hinceta ku ez pîr bûme û wekî berê nikarim baran hildim, ez qewirandim.

Ker jî dibe rêhevalê dîk û bi hev re dimeşin.

Demekê bi şûn de rastî kûçikekî tî. Kûçik ji wan dipirse:

- Gelî hevalan! Xêr e hûn ji ku derê tî û bi ku derê de diçin?

Li ser vê dîk û ker serboriyên xwe dibêjin. Tu nabêjî derdê kûçikê reben jî ji yê wan ne cudatir e.

Îcar ew qala serboriya xwe dike, dibêje:

- Hevalên hêja, xwediyê min jî wekî yê we bera min da, ez ji mala xwe qewirandim. Hinceta wî ew bû ku; Xwedêgiravî ez wekî berê nikarim li pez û dewarên wî xwedî derkevim û nikarim çavnêriya mala wî bikim.


Dîk, ker û kûçik bi hev du re didin rê dimeşin. Pişfî demekê di
rê de rastî pisîngekê tên.

Pisîng bang li wan dike, dibêje:

– Gelî birayan hûn bi ku derê de diçin, ma hûn min jî bi
hevalfî qebûl nakin?

Xwediye min ez ji mala xwe qewirandim, li gofê ku dibêje;
temenê min mezin bûye û ez nema wekî berê karim mişkan
bigirim.

Pişfî ku pisîng jî serboriya xwe dibêje, ew jî tevî qefleya lawirên
beredayî dibe û bi hev du re dimeşin.



Demekê dimeşin, tên xwe digihînin ser ziyaretekê. Şev bi ser wan de tê, li wê derê lawirên goşt-xwir berateyan dibînin û yên giyaxwir jî giyaninan dibînin.

Piştî têra xwe xwarina xwe dixwin, ker dibêje:

– Gelî hevalan biborînin, lê zira min hat, divê ez bizirim.

Lawirên din li ber wî digerin, lavayiyên dikin, dibêjin:

– Eman hewar birayê ker! Ev der navsera çiyayan e. Qey tu dixwazî ku gur bi me bihesin û werin me ji hev zîtolzîtolî bikin?

Dikin û nakin ker ji ya xwe nayê xwarê û dibêje:

– Heyran ma di destê min de ye? Ez nikarim. Dema zira min bê divê ez bizirim.

Axir ker dilê xwe rehet dike, dizire. Lê bi zirîna ker re; wekî ku lawiran gotibû bi carekê gur dorê li wan digirin. Dîk ji tirsê pîr dide ser darê û bang dide, piştî bi neperûşkan radipelike darê û kûçik jî ji tirsê, xwe wekî termekî li erdê dirêj dike.

Dema gur nêzîkiyê li wan dikin ew jî ji vê rewşê ditirsin û bi paş de vedikişin.

Gurê mezin ê ku serekê wan bû; dema dibîne gur hemû bi paş ve tînin, ji wan dipirse:

– Ka nêçîra we? Çima hûn destvala vegeeriyân?

Yek ji wan guran lê vedigerîne, dibêje:

- Axayê min, dema em gihaştin ber wan; me dît ku melayek ji wan derketiye ser minareyê bangî gel dike, pişîngeke wan hebû ji kerban dar dida ber neperûşkan û kûçikekî wan ê xedar hebû hema li erdê teqle didan.

Piştî me ev dîtin, hema bi zorê me xwe ji nava lepên wan xilas kir.

Çavkani: Geleri





MAR Î
MIROU



MAR Û MIROV

Hebû tune bû, li welatekî xerîb mêrikek hebû.

Mêrik li çolekê bi rêya xwe de diçe. Di rê de rastî marekî tê. Mar di binê kevirekî mezin de asê maye, ne kare ji binî derkeve û ne jî kare xwe bilivîne.

Dema mêrik çav li halê wî dikeve dilê wî pê dişewite û radihêle wî kevirî jî ciyê wî radike û mar ji wê rewşa xirab xilas dike.



Lê ji dêliva ku mar ji wî re spasiyê bike, tew bi ser de xwe dirêj dike da bi mêrik vede. Mêrik çav li vê helwesta mêr dikeve, ecêbmayî dimîne û ji mêr dipirse:

- Maro heyrano! Ma ne min tu ji mirinê xilas kirî! Îcar berdêla vê başiya min ev e ku tu bi min vedî, min bikujî?

Mar dibêje:

- Ma tu nizanî ez û tu em dijminên hevdu yên berê ne?

Divê ez bi te vedim.

Mêrikê feqîr dike nake, mar ji ya xwe nayê xwarê. Lê dinêre nikare xwe ji destê mêr bifilitîne. Pêşniyarekê lê dike, dibêje:

- Madem wisa ye, qet nebe em herin cem aqilmendekî vê rewşa xwe jê bipirsin.

Dibe ku ew rêyekê ji me re bibîne.

Mar vê pêşniyara wî dipejirîne û herdu radibin didin rê.

Di rê de rastî roviyekî tên û hal û meseleyê jê re dibêjin.

Rovî li halê mêrik dinêre, di ber xwe de dikene. Bi dû re ji wan re dibêje:

- Divê ez ciyê bûyerê bibînim û paşê ez biryara xwe bidim.



Her sê didin pê hev vedigerin tên ciyê ku mêrik mar xilas kiribû.

Rovî ji mêrik re dibêje:

– Birako ka tu wî kevirî rake!

Pişfî mêrik radihêle kevir ji ciyê wî bilind dike, rovî îcar ji mêr re dibêje:

– De ka birakê mêr tu jî dîsa wekî berê têkeve binê wî kevirî!

Pişfî mar dikeve binê kevir, rovî ji mêrik re destnîşan dike û mêrik dîsa kêvir dide ser mar. Lê dem derbas dibe, deng ji rovî dernayê.

Mar di binê kevir de, bang li rovî dike:

– Birakê rovî! De ka biryara xwe bide, ez di binê vî kevirî de dikim bipelçiqim!

Li ser vê gotinê, mêrik hêzê dide xwe ku kevir ji ser mêr hilîne lê rovî nahêle, dibêje;

– Birakê delal, nebî tu careke din wî kevirî ji ciyê wî hilîni!

Mêrik û rovî mêr di binê wî kevirî de dihêlin û lê dixin diçin.

Çavkani: Geleri

Amadekar: Mehmet Ollmez





MIŞKÊ FETEH Û
MIŞKÊ WELO

MIŞKÊ FETEH Û MIŞKÊ WELO

Hebû tune bû, du mişk hebûn.

Navê yekî mişkê Feteş bû û navê yê din jî mişkê Welo bû.
Mişkê Feteş yekî jar û lawaz bû, hingî lawaz bû hema li ser
piyan bû. Lê mişkê Welo berovajî wî heta tu bibêjî xurt bû, te
digot qey hew xwariye û razaye.

Rojekê her du mişk rastî hevdu tîn. Mişkê Welo çav li halê
mişkê Feteş dikeve, dilê wî pê dişewite, dibêje:

- Ji bo çi tu ew qasî lawaz î? Tu şatiyayî! Meriv dibêje qey tu li
ber nan û avê girê dane! Ev derdekî te heye an tiştek bi serê
te de hatiye?



Mişkê Feteh lê vedigerîne, dibêje:

- Heyran bela xwe ji min veke! Derdê min mezin e.

Mişkê Welo bi ser de diçe û dibêje:

- De delaliyan meke! Meriv derdê xwe nebêje, dermên jî nabîne.

Li ser vê yekê mişkê Welo bersivê didê, dibêje:

- Dijminekî min heye qet nepirse! Dema dengê wî tê min qatek goşt ji min diçe.

Mişkê Welo dibêje:

- De ka dijminê te li ku ye, bibêje?

Mişkê Feteh dibêje:

- De were bide pê min, em herin serdera derî; em li wir bisekinin, dema hat ez ê nîşanî te bidim.

Her du mişk radibin diçin serdera derî, li wê derê disekinin.

Demekê bi şûn de ga tê derbas dibe. Mişkê Welo dipirse:

- Dijminê te ev e?

Mişkê Feteş dibêje:

– Na, ne ev e.

Bi dû re lê dinêrin çêlek tê. Dîsa Mişkê Welo jê dipirse:

– Ma dijminê te ev e?

Mişkê Feteş serê xwe dihejîne, dibêje:

– Na xêr, ne ev e jî.

Bîskeke din dimînin vê carê hesp tê. Mişkê Welo dîsa jê dipirse:

– Qey dijminê te ev e?

Lê mişkê Feteş dîsa serê xwe bi neyînî dihejîne û dibêje:

– Na birako! Ne ev e jî, de ka sebir bike wê gaveke din derkeve holê.



Qederekê bi şûn de pisîng der tê, çawa dike nawinî hema
mişkê Welo ji tirsê dibê "vir vir " xwe diavêje xwarê.

Mişkê Fetah bang lê dike, dibêje:

– Malxirabo!

Te hîn bi dengê wî re xwe avêt erdê. Ê min qet nebe ez
bitirsim jî, hîn li piyan im.

Meriv divê li hemberî dijminê xwe ew qasî qels nebe.

Dibe ku meriv ji dijminê xwe bitirse lê divê meriv xwe jê karibe
biparêze û li hemberê wî karibe bergiriyên xwe bigire.

Dîrok: Reşemî 2015,

Herêm: Gundê Selman

Çîrokbêj: Zumreta Meşe

Temenê Çîrokbêjê: 1964

Berhevkar: Zerrîweş Esnaw



A decorative teal-colored shape with a scalloped, cloud-like border. It contains several small white stars and is surrounded by larger yellow four-pointed stars.

LJHEURASTHATINA
GUR Û ROUÏYË



LIHEVRASTHATINA GUR Û ROVIYÊ

Hebû tune bû, gurek û roviyek hebû.

Ew, rojekê rastî hev tên. Her du jî birçî bûne û divê herin nêçîrê da xwe têr bikin. Rovî bi fenekiya xwe û gur jî bi xurtbûna xwe dipesinin.

Lê kêmasiya her duyan jî ew bû ku; dema nêçîra lawirên din dikirin, taybetmendiyên wan qet nedifkirîn.

Pêşî gur dipeyive, dibêje:

– Xwişka roviyê, wa ye tu jî zanî, em her du jî birçî ne. Ma te li van deran tu tişt nedîtine ku em ji xwe re herin nêçîra wan?



Rovî lê vedigerîne û dibêje:

– Ez bi serê te kim, birakê gur; li vî joî deştek heye û berî niha bi qasekê ez di wir re derbas bûm. Min hespek dît li wir diçêriya, hingî spehî bû wekî şûşeyê dibiriqî. Te digot qey meriv mûyekî ji laşê wî bikişîne, wê laşê wî biqelişe. Ew qasî paqij bû.

Dema rovî wisa dibêje, gur pê re sist dibe û dibêje:

– Heke wekî ku tu dibêjî be, hesp li ser xwe ye û bi qelafet e. Ez jî êdî kal im, ne wekî berê me, hêza min têra wî nake. Bila bimîne, dev jê berde.

Li ser vê bersiva gur, rovî ji bo gur lê sor bike dibêje:

– Birako, ma tu çî li qilafetê wî dinêrî? Tu li hunerê xwe binêre! Ma ew kare ji ber pençe û diranên te bireve? Dema tu diranên xwe nîşanî hesp bidî, wê ji tirsan bikeve û em ê jî têkevin ser û bi dilê xwe wî bixwin.

Rovî bi van gotinan, gur nerm dike. Gur jî dibîne ku rovî pesnê wî dide, ew jî hinekî bi xwe bawer dibe û dibêje:

– Madem wisa ye, de bide pêşiya min em herin. Ka ev hesp li ku ye?

Demekê dimeşin, paşê xwe digihînin ciyê ku hesp lê diçêre. Dema gur çav li hesp dikeve, li roviyê vedigere û dibêje:

– Wele xweha min, te kêm gotiye, zêde negotiye! Hesp têra xwe gir û qelew e. Îcar divê em fenekê bînin serê wî ji bo wî bixapînin û ji xwe re bikin şîv.

Tên ba hesp û silavê didinê, hal û demên wî dipirsin. Paşê gur jê re dibêje:

– Ka bibêje tu ji ku derê yî, ji kîjan malbatê yî?

Hesp fehm dike çavê gur li fenan e, dixwaze wî têxe dafikê.

Li gur vedigerîne, dibêje:

– Tiştên te pirsî, li bin lingê min nivîsîne, lê xwendina min tune ye.



Li ser van peyvên hesp, rovî fehm dike ku hesp jî dixwaze wan têxe dafikê. Ji hesp re dibêje:

– Bi Xwedê birako! Ez jî wekî te me, xwendina min jî tune ye.

Lê gur qet kêmasiyekê di xwe de qebûl dike! Hema di cî de dibêje:

– Min heft pirtûk xwendine, ez zanist im.

Ji xwe hesp jî li benda vê bersiva gur bûye. Ji gur re dibêje:

– Ê de madem xwendina te heye û tu zanist î, kerem bike were. Ez ê lingê xwe yî paşiyê bilind bikim, nivîs li wir e û bixwîne. Em jî bi xêra te hîn bibin ku ez ji kîjan malbatê me.

Gur ji kêfan zû-zû diçe pişt hesp û devê xwe ji hev vedike, diranên wî diçirisin li bendê ye ku hesp lingê xwe rake û ew jî dev lê bike. Lê dema hesp lingê xwe radike, hema ji nişkê ve li nava devê gur dixê. Gur piştî vê derbê dikeve erdê û hema bibêje deh teqleyan diavêje, gêr dibe diçe wî aliyê.

Dibe hawar-hawara wî û ji êşa derba hesp xwe li erdê digevizîne.

Dawiyê tê ba roviyê û jê re dibêje:

– Erê roviya fenek, te ev fen hanî serê min, ne?

Rovî dibêje:

– Heyran ma çî gunehê min heye? Te negotiba “Min heft pirtûk xwendine, ez zanist im.” Çî kir te bi serê xwe kir. Hay û gumana min tê de tune ye.

Piştî van peyvan, rovî tavi lê xwe dide alî. Ji wan deran dûr

dikeve. Gur jî paş stûyê xwe dixurîne û di ber xwe de dibêje:

– Tenê ev derb ji min re kar ma!

Hesp dîsa dest bi çêreya xwe dike û şîretê jî li gur dike, dibêje:

– Vê yekê qet ji bîr meke! Neheqiyê li tu candarekî/ê meke û wan mexe dafikê. Zanibe ku her candarek taybetmendiyan wî/wê yan ku xwe diparêze hene!

Çîrokbêj: Dat Yunus

Berhevkar: Hacî OZKAL





ROVIYA
HÛVQOL

ROVIYA DÛVQOL

Hebû tune bû, gurek û roviyek hebûn. Rojekê rovî kurkekî li erdê dibîne. Radihêle wî kurkî û dibe li malê vedişêre.

Demekê bi şûn de, rovî rasfî gur tê. Dixwaze gur bixapîne, nêzîkî wî dibe û jê re dibêje:

– Birakê gur were, ez ê tiştekî bidim te.

Piştî gur pê re diçe, rovî wî kurkî nîşanî wî dide. Dema gur çav li kurk dikeve, pir kêfa wî tê. Ji roviyê dipirse dibêje:

– Xwişkê, ma te ev kurk li ku dît? Pir xweşik e.



Rovî bersivê didê:

– Heyran, ma tu nizanî! Bavê min kurkvan e, diya min û bapîra min hemû kurkvan in. Em bi malbatî kurkvan in.

Li ser vê yekê gur dibêje:

– Ê madem wisa ye, de ka tu karibî ji min re jî kurkekî çê bike.

Ji xwe rovî jî li benda vê daxwazê bû; ji lew re çavê roviyê lê bû ku bi vî hawayî gur bixapîne, goştê lawirên ku wê gur bîne bixwe û paşê bi fenekî xwe ji gur xilas bike.

Rovî ji gur re dibêje:

– Li ser çavan, birakê gur. Ma çawa ez ji te re kurkekî çê nakim? Lê divê tu herî nêçîra lawiran, tu wan bigirî bînî. Ez ê laşê wan bigurêm û bi çermên wan ji te re kurkekî pir xweşik çê bikim.

Gur bi van peyvan kêfxweş dibe û diçe nêçîrê.

Bizinên xelqê ji nava keriyên wan yek bi yek direvîne tîne ber qula roviyê. Rovî jî wan dixwe û her cara ku gur tê rewşa kurk dipirse.

Rovî dibêje:

– Wa ye hindik ma, hema li ber qedandinê ye.

Carekê, du caran, sê caran... êdî gur dikeve şikê û rojê çend caran tê ber qula roviyê rewşa kurk dipirse. Dawiya dawiyê rovî jê aciz dibe û dibêje:

– De baz de ji vir! Ma tu dibêjî qey bavê min kurkvan e! Haydê yela!

Gur ji ber deriyê xwe diqewirîne.

Gur lê dinêre rewş xirab e. Li benda roviyê bimîne heta ku ji qulê derkeve, wê ji fî û birçîna bimore. Lê dev jê berde jî nabe. Difikire difikire... tiştêk tê bîra wî. Radibe diçe kundirekî hişk fîne, mêşekê dixê hundirê wî û li ber devê qula roviyê dadiliqîne û ji wê derê diçe.

Rovî di qula xwe de di ser goşt de ye. Hingî goşt dixwe fî dibe, lê her cara ku dike derkeve derve dengê vinge-vinga mêşa di kundir de tê, dibêje qey gur hê jî li ber qulê ye.



Lê hingî fî dibe nema debar dike û dibêje:

– Ez derkevim an wê gur min bixwe, an jî ez ê bifilitim. Lê ku ez dernekevim ez ê ji fîna bimirim.

Rovî biryara xwe dide çavên xwe digire û ji qulê baz dide derve. Lê gava li paş xwe dinêre ku çi bibîne? Kundîrek li ber qulê daliqandî ye û ew deng ji wî tê. Rovî radihêle wî kundirî û bi dûvê xwe ve girê dide, pê dilîze, lotikan diavêje tê heta ber çem. Li wê derê xwe bi xwe dibêje:

– Wele divê ez vî kundirî bixeniqînim û hema kundir di avê re dike. Kundir tije av dibe û bi wê giraniyê noqî avê dibe, lê ji ber ku bi dûvê roviyê ve girêdayî bû wê jî bi xwe re dikişîne binê avê. Rovî dike hawar-hawar:

– Kundiro min berde min tu berdayî, kundiro min berde min tu berdayî...

Lê kundir wê berdide! Hema dûvê wê di ber de dibêje “qirp” û jê dibe. Êdî roviya me dibe dûvqol...

Rovî diçe ku, teyr û tilûr, lawir; çi candar hene henekên xwe pê dikin. Dibêjin:

– Roviya dûvqol...

Û li pê wê baz didin, li dorê digerin wê hêrs dikin.

Rovî difikire ku çawa heyfa xwe ji wan bigire. Bang dike wan, dibêje:

– Geî lawir, teyr û tilûran! Werin, werin em herin nav rêz tirî bixwin!

Wan dixapîne dibe bera nava rez dide û li aliyê din jî diçe gazî xwedyên rêz dike. Xwedyên rêz radihêlin çekên xwe û bi ser lawir, teyr û tilûran de tîn. Wan gişan dikujin, lê rovî xwe difilitîne. Bi vî hawayî heyfa xwe ji yên ku henekên xwe pê dikirin hiltîne.

Dîrok: Tebax 2016

Herêm: Zereyê Gêlî / Amed

Çîrokbêj: Şerîfa Aktay

Temenê Çîrokbêjê: 1960

Berhevkar: Zerrîweş Esnaw





SÊ DÏK

SÊ DÎK

Hebû tune bû. Sê dîk hebûn.

Yek sor bû, yek reş bû û yek jî sipî bû. Li ser rûyê erdê xwedyê van dîkan tune bûn. Her sê dîk ji bo ku stareyekê bibînin û têkevin binî bi rê dikevin.

Diviyabû heta êvarê ji xwe re staregehek peyda bikirana an na wê gur ew bixwarana. Ji lew re gunehê gurên devbixwîn bi tu kesî nedihat.

Her sê dîk demekê dimeşin, di rê de rastî kerpîçinan tên. Dema çav li kerpîçan dikevin, biryarê didin ku, ji xwe re bi wan xaniyekî lê bikin.



Dest didin destên hev û di demeke kurt de xaniyekî ava dikan.
Piştî ku lêkirina xênî xilas dibe, dîkê reş ê ku di nav wan de yê
herî gir bû; bi hinceta ku wê derî biceribîne, ka xweş tê girtin
an na, her duyên din derdixîne derve.

Lê piştî ku dîkê sor û spî derdikevin derve, dîkê reş derî li ser
xwe digire û dikan nakin ji wan re derî venake.

Her du dîk ji neçariyê radibin didin rê. Demeke dirêj dimeşin,
dîsa di rê de rastî kerpîçinan tên. Kêfa wan tê, careke din bi
kerpîçan dest bi lêkirina xaniyekî dikan. Wekî berê dîsa alî hev
dikan û di demeke kurt de xaniyê xwe xilas dikan.

Vê carê îcar dîkê sor bi hinceta kontrolkirina derî dikeve
hundir û derî li ser xwe asê dike. Dîkê spî yê ku di nav wan de
yê herî biçûk bû dike nake dîkê sor derî lê venake.

Dîkê spî radibe bi rê dikeve, lê tu hêviyeke wî nemaye. Ji ber
ku tenê mabû, zanîbû ku bi tena serê xwe nikare stargehekê
çê bike û wê heta êvarê gur ew bixwara. Li aliyekî bi rê ve
diçe û li aliyekî jî digirî.

Hema ji nişkê ve periya daristanê li hemberî wî derdikeve
holê.



Perî jê re dibêje:

– Megirî dîkê spî megirî! Te xerabiyek bi kesî nekiriye. Tu yekî dilpak î. Hevalên te bi te re ne rast bûn, wan tu ji hundir avêtiyî derve. Lê xeman nexwe, ez ê ji te re xaniyekî zexmtir û xweşiktir çê bikim.

Perî, darikê xwe yê bisêhr çawa li qurma dara çamê dide, qurma darê vediguhere qesreke mezin. Dîkê spî derî vedike dikeve hundirê qesrê û li pê xwe derî asê dike.

Di wê navberê de gur, pir birçî dibe û bîna dîkan hiltîne, dide pê wan. Pêşî berê xwe dide mala dîkê reş. Deriyê mala wî bi nehperûşkan vedike, dikeve hundir û wî dixwe. Bi dû re tê ber deriyê dîkê sor, deriyê wî jî bi nehperûşkan vedike û wî jî dixwe. Paşê tê ber deriyê dîkê spî. Lê dike nake nikare deriyê wî veke; ji lew re periyê pir zexm çê kiribû.

Bi vî hawayî dîkê spî ji destê gurê devbixwîn difilite, lê her duyên din ji ber çevnebariya xwe dibin xwarina gur.

Çavkanî: Gelêrî

Amadekar: Mehmet ÖLMEZ






ZILAMÊ DILPAK

Zilamekî dilpaqij û saf hebû.

Zilamê me rojekê diçe bajêr ji bo pêdiviyên xwe. Li çarşiyê rasfî qerebalixekê tê, meraq dike û ber bi wir de dimeşe.

Dema nêzîkî koma mirovan dibê, lê dinêre zilamek di nava wê komê de, bang dike dibêje:

- Gelî mirovan! Ez îro vî kûçikî difiroşim. Kî vî kûçikî bikire wê jê fêdeyê bigire û kî nekire wê zîrarê bibîne!



Zilamê me hema di cî de bihayê kûçik dipirse û dawiyê heqê wî dide û kûçik dikire.

Demeke din li nava bajêr digere, dibîne wa ye dîsa zilamek diqîre. Vê carê mişkek pê re ye û bang dike dibêje:

– Ew ê ku vî mişkî bikire wê jê fêdeye bigire û yê ku nekire wê jê xisarê bibîne!

Zilamê dilpak dîsa diçe ba wî zilamî û vê carê jî mişk jê dikire û bi rêya xwe de diçe. Bîstekê bi şûn de zilamê dilpak dîsa rastî wî zilamî tê, vê carê pisîngêk pê re ye û wekî cara din dîsa bang dike:

– Gel û gundîno! Werin ez vê pisîngê difiroşim. Îro kî vê pisîngê bikire wê fêdeyê jê bibîne lê kî ku nekire wê zîrarê jê bibîne.

Zilamê dilpak çawa her du lawirên din kirîbûn, wisa jî pisîngê jî dikire û berê xwe dide malika xwe.

Mirovên wê derê li vê helwesta zilamê dilpak ecêbmayî dimînin, bi çavê dînan lê dinêrin. Ji lew re kûçik, pisîng û mişk ne lawirên ku li hev du bikin, nîn in.

Piştî zîlamê dilpak tevî lawirên xwe diçe malê, şîretan li wan
dike dibêje:

– Ji îro pê ve divê hûn wekî xwişk û birayan bi hev re bijîn.

Ji hev du re baş bin û xerabiya hev nexwazin!



Lawir van gotinên xwediyên xwe dipejirînin. Ji wê rojê bi şûn de wekî xwişk û birayan bi hev du re dijîn.

Rojekê li hev du kom dibin û dibêjin:

- Madem xwediyê me ew qasî qenc û dilpak e, divê em jî jê re bi fêde bin; lê em çî bikin em fêdeyê bigihînin wî?

Difikirin ku herin ji deryayê jê re masiyan bigirin û bînin bidinê. Pisîng xwe diavêje deryayê masiyekî digire û fîne dide xwediyê xwe.

Piştî zikê masî diqelişînin dibînin ku wa ye elmasekê tê de ye.

Li ser vê yekê zilam pir kêfxweş dibe.

Di dawiyê de fêdeya dilpakiyê bi vî hawayî dîtiye.

Herêm: Gundê Piranê, Hopê

Berhevkar: Zaza Cebelî



Cinawirê Bêbext
Du Roviyan Fenek
Qijik û Çêlikên Wê
Lawirên Beredayî
Mar û Mirov
Mişkê Feteh û Mişkê Welo
Lihevrastrhatina Gur û Roviyan
Roviya Dûvqol
Sê Dîk
Zilamê Dilpak



Ev xebat bi piştgiriya Yekîtiya Ewropayê di çarçoveya Bernamya Alîkariya Mafan de hatiye amadekirin. Berpirsiyariya naveroka xebatê bi tevahî aîdê Weqfa Koçberiyê û Alîkariya Mirovî ye, nêrînên Yekîtiya Ewropayê û/an jî Bernameya Alîkariya Mafan rave nake.

Bê pere tê belavkirin